

Piştgiriya kesên mexdûr hûn cawa dikarin bikin

- ▶ Eger hûn êrişek bibînin ruyê xwe neguherin û bi rêxistin alîkariye bidin û li gor hewcedariya kesên mexdûr tevbigerin.
- ▶ Piştgiriya xwe pêşkesî kesên mexdûr bikin û agahiyê li ser xizmeta şewirmendiya me bidin.
- ▶ Ji karê şewirmendiya serbixwe em dixwazin tundîya rastgir a li Thüringenê bidin belgekirin. Ji ber vê yekê tika me ew e kû hûn di vî warêde agahiyan bidin me. Karê agahîdayîne hûn dikarin anonîm jî bicîhbînin.



Sipas ji bo bexşên we!

Mexdûrên tundîya rastgir, nijadperest û dij-semîtik li Thüringenê dikarin bi lez û bez û bi hêsanî ji Fon a alîkarîyê, piştgiriya aborî bistînin. (Minak; heqê parêzeran).

Dêra Protestan ya Navîna Elmanyayê
IBAN DE26520604100008000000
Bank Evangelische Bank
BIC GENO DEF 1EK1

Sifre: Opferhilfsfonds
(FonaAlîkarîyaQurbaniyan)

***Ezra li Thüringenê ji bo
mexdûrên tundîya rastgir,
nijadperest û dijî-semîtik
navende şewirmendiya pispore.
Ji ber vê yekê em piştgiriya
kesên şidet lê hatinê kirin,
dikin û daxwazî û perspektîfên
wan bi rayagiştîre parvedikin.***

**Ezra- Li Thüringenê şewirmendiya ji bo
mexdûrên tundîya rastgir, nijadperest û dijî-
semîtik.**

Juri-Gagarin-Ring 96/98
99084 Erfurt
Tel: 0361-21865133
Fax: 0361-21863013
Email: info@ezra.de
Web: www.ezra.de
Facebook: @Opferberatung.ezra
Instagram: @ezra_online
Twitter: @ezra_online

Ezra; Projeyek li navîna
Elmanya yê ji aliyê dêra
Protestan ve hatiye
piştgirîkirin. Ezra ji aliyê
programek herêmî li
Thüringenê ji bo demokrasi,
musamaha û kozmopolîtîk
a bi navê "DenkBunt" û
program ya fêderalî bi
navê "Demokrasi leben" tê
finansîkirin.



Demokratie **leben!**



ezra Info-Faltblatt KU /Kurdisch · 12/2020 · Auflage: 2.500



ezra.de



*Li Thüringenê
Şewirmendiya Ji Bo
Mexdûrên Tundiya
Rastgir, Nijadperest û
Dij-Semîtik*

Em Dikarin Çi bikin?

Şêwirmendî

Em şêwirmendiyek bilez û nerm pêktînin û şert û mercên ewle, ji bo kû hûn karibin serpêhatiyên xwe, li cîhê ku hûn lê ne an jî li cem me, vebibêjin, ji were avadikin. Ji bo ku hûn karibin encamên tundiya rastgir dabeşînin û di rewşên krîzê de di warê pêşxistina hilbirjkên tevgerê de em dibin alîkar.

Hevalbendî

Li gor xwesteka we em dikarin tevî hevdtîninê we yê fermî (Polîs, dadgeh hwd.) û herwiha hevdtîninê bi bijîjk, terapîst û parêzeran re, bibin. Ji bo van randevûyan xebatên amadekar piştî jî bo şopandinê bi we re axaftinan pêktînin.

Piştgirî

Em di lêgerîna we ya ji bo parêzer, terapîst û bijîjkan dibin piştgir û di serîlêdana diwarê alîkarîyên aborî û tezmînatê de alîkariya we dikin. Em, ji bo hûn, bi kesên karibin alîkarîyê bidin we û bi kesên weka we mexdûr re karibin bikevin têkîliyê rêyan nîşanê we didin. Li gor daxwaziya we em mijara we bi rayagiştîre parvedikin. Xebatên me yê piştgiriyê li gorî hewcedarîyên we yê şexsî tînin li darxistin û ger pêwîstî çêbe, bi wergervanan re jî xebat têkin.

Kî dikare bi me re bikeve nava têkîliyê?

Kesê mexdûr û nasên wan. Kesên bûne şahidên sucên tundî.

Eger

- ▶ Bi armancên nîjadperestî (Mînak; Nîjadperestiya Gadjê (Nîjadperestiya li dijî Mitripan) Nîjadperestiya li dijî Misilmanan, Nîjadperestiya li dijî reşikan- Efrîkaniyan.)
- ▶ Bi Armanca Nîjadperestiya li dij-semîtik
- ▶ Ji ber tevgera we ya alternatîv û/an helweste we ya "neheq"
- ▶ Ji ber tercîha we ya cînsî û/an nasname we ya zayendî
- ▶ Ji bo armancên darwînîstên ciwakî (Mînak mirovên demêdirêj bekar û bermal, kesên seqet)
- ▶ Ji ber çalakiyên we yê dijî rastgir û ji bo mafên mirovan
- ▶ Ji ber xebatên rojnamevanî (Mînak; lêkolîna li ser zext a rastgir)
- ▶ Ji ber tevgera we ya olî

Li dijî we êriş pêkhatibin, têkîliyê bi me re deynin.



Em şidetê wekî tundîya fizîkî (birîndarkirin, kuştin, şewitandin û talankirin) dibînin û herwiha, gefxwarin, zordarî û zîrar dayîna bi zanebûn a li hember mexdûran jî weka cûreyekî tundîyê dinirxînin.

Gilfikirina we ya bo rayedaran ji bo xebata sêwirmendiya me ne girînge. Di rewşên ku lêpîrsîn û darizandina bûyerê nehatibe kirin jî hûn dikarin têkîliyê bi me re deynin. Ger kiryarên bûyerê polîs be jî, em karê şêwirmendiyê bicîhtînin.

☎ **0361 - 21865133**

✉ **info@ezra.de**

Prensîbên Me

Alîgir

Teqez em li nik we cîh digrin û gotinên we digrin cidîyê.

Serbixweyî

Xebatên me, ji rayedarên dewletê, yê dadgehê û polîsan serbixwene.

Veşartî

Hevdtîna şêwirmendiyê veşartîye. Bê destûra we tu caran ji kesên din re nayên gotin. Em li ser esasa nepeniyê kar dikin.

Bêpere

Xizmeta şêwirmendiyê bêpereye.

Anonîm

Hûn dikarin xizmeta şêwirmendiyê bê ku agahiyên xwe yê şexsî bidin, bigrin.